



## BÊZENASIYA ZMANÊ KURDÎ YA GIŞTÎ

-41-

kuKurm-n.: *hêvî* m.

• hewremânî/gorânî

• kirmânckî/dimilî/zâzâkî/kirdkî

• kurmâncî/kirdâsî<sup>1</sup>

• lorî

• sorânî

<sup>1</sup> Peyva *kirdasî* [kärdäsi] di zaraveya kurdîya dimilî/kirdkî/zâzâkiya nu da žibo zaraveya *kurmançî* tê bi kar hanîn. Paşlêka -asî žî peyva *kasî* [kâsî] «bićuk» têt, wekî *tengasî*, *kurtasî*, *kêmasî* u hwd. Lewra peyva *kirdasî* di raštiyê da wateya «kurdîya bićuk» dide.

Rêzenaverok:

- Dengnasî u bêzenasiya peyva *hêvî* m. (r. 3–4)



Žibo barkêşê zaraveya  
kurdiya kirdkî/dimilî  
(u kurmancî),  
dilsožê peyvikên bav u kalan  
yê xwadî wîzdan:

RoŞAN LEZGİN

## [ Dengnasî u bêzenasiya peyva *hêvî* m. ]

Peyva kurdiya kurmanciya nu *hêvî* m. [hêvî] digel farsiya nu *umîd/umêd* bii heta teşeya kurdî u iraniya kevin \*abi-mati-/upa-mati- m. şun da terre. Ev peyv wekî din di nav zmanêñ din yêñ ûrânî da xuya nabe. Zîber vê hindê divêt herî dereng di dema zmanê ûrânî-ariya navîn da wekî peyveke serbixwa hatî bibe bi kar hanîn. Teşeya peyvê ya di dema zmanê hîndî-ewrupî yê bingehîn da ne heşkere ye. Dibe ku hingê di nav zmêñ da wekî têgêze/têgeh hee bibuya.

- kuKurm-n. *hêvî* m. [hêvî] ← kuKurm-nv. \*hē-vî ← \*hē-vē ← \*Hē-vây ← \*Hē-vah<sup>i</sup> ← \*Hē-vað ← \*Hē-mað ← \*Hai-mad ← \*Hā.i-mat ← \*Haþi-mat ← kuKurm-k. \*Habi-mati- m. «lêpan/lêpayîn m.» < arpaś. \*H2ab<sup>h</sup>i-mati- < hepaś. \*h2mb<sup>h</sup>i-maði-.

<sup>?</sup> Di zmanê avestî da peyva *upamaitîm* (digel äste ks. 3. yk. prez. < aāh- «runištin») xuya dibe u wateya «divêt meriv bipê, lê payîn/lê pan heta ku ...» dide. Peyva *upamaitîm* zi teşeya xwa ya kevin \*upa-mati- m. «lêpayîn/lêpan m.» têt (≈ wpehl. *pāyišnīh, manišnīh*)<sup>2</sup>, zi:

- upa- «bi, tevî, digel, ligel; bii, lii, bii ... da/va; li; heta ...; di ... da; li ser ...» (→ kurd. *bi*).
- mati- m. «pan/payîn m.», zi kiryara *man-* «man/mayîn», kuKurm-n. *man/mayîn*, av-c. *man-*, ved. & skt. *man-*, yon-k. *mén-ō* < hepaś. \*men- «man/mayîn, payîn/pan».

KuKurm-n. *hêvî* u av-c. *upamaitîm* LERCH di sala 1858an da ruberîhev kirî bu<sup>3</sup>. Peyva kuKurm-n. *hêvî* divêt bi teşeya kevin \*Habi-mati- va girêdayî bibe, bi radî zî zîber dengdêra -e-. Lê li hêla din zîber harmoniya vokalîzmusa di kurdiya kurmanciya nu da merî hew dikane dibêtiya \*Hupa-mati- zi ber ćav bike.

- kuKurm-n. *îvî*<sup>4</sup>, *hîvi*<sup>5</sup>, *hêvi*<sup>6</sup>, *hêvî*<sup>7</sup> «hêvî»,
  - *îvî dekim* «hêvî dikim». <sup>8</sup>
  - *bé îvî bu* «bê hêvî bu». <sup>9</sup>
  - *be îvî bum* «bê hêvî bum». <sup>10</sup>
  - *hîvi nékiri* «hêvî nekirî». <sup>11</sup>
  - *ézi be hîvia xóe ézi mahîrum bebîm*<sup>12</sup> «ez ê bi hêviya xwa zê mehrum bibim».
  - *hîvia xo že dekim*<sup>13</sup> «hêviya xwa zê dikim».
- kurd-n. *umûd*, *umîd* bdg. «hêvî»<sup>14</sup> < ? fars-n.
- kuKrd-n. *umúd*<sup>15</sup>, *umid*, *umîd*, *umud*<sup>16</sup> «hêvî»,

<sup>2</sup> BARTHOLOMAE 1904: 391.

<sup>3</sup> LERCH 1858: 87b.

<sup>4</sup> GARZONI 1787: ...; LERCH 1858: 87b, 96b; JUSTI 1880: 23, 27, 45, 96, 100.

<sup>5</sup> LERCH 1858: 87b; JUSTI 1880: 23, 27, 45, 82.

<sup>6</sup> NÖLDEKE 1868: 48.

<sup>7</sup> GEIGER/HUHN 1895-1901: 267.

<sup>8</sup> LERCH 1858: 87b.

<sup>9</sup> LERCH 1858: 87b.

<sup>10</sup> LERCH 1858: 87b.

<sup>11</sup> LERCH 1858: 96b (zi SHABA).

<sup>12</sup> LERCH 1858: 96b (zi SHABA); rbb. JUSTI 1880: 128.

<sup>13</sup> LERCH 1858: 96b.

<sup>14</sup> HORN 1893: 26, № 109.

<sup>15</sup> MÜLLER 1865: 6, 7; GEIGER/KUHN 1895-1901: 267.

<sup>16</sup> MALMISANJ 1992: 364.

► *umîdey, umudey*<sup>17</sup> «hêvî, hêvîtî».

? u- li śuna \*ū, divêt teśaya \*ummēd di kuKrd-n. da teśaya \*wämēd/\*ūmēd yan žî \*wämīd/\*ūmīd bidayî bibuya, Žiber ketina dengê -m-.<sup>18</sup>

• bel-n. *ummēd, ûmēd* bdg. «hêvî»<sup>19</sup> < fars-n.

• fars-n. *umîd*<sup>20</sup>, *umēd, ummēd, ûmēd*<sup>21</sup>, *ummēd*<sup>22</sup>, *umēd, umēd*<sup>23</sup>, *umēd*<sup>24</sup> «hêvî» (← \*upa-mati- «pan/payîn m.», žî man- «man/mayîn»).

? HÜBSCHMANN žibo teśaya bingehîn ya farsiya kevin \*aŋamaati- u avestî žî \*aŋamaæti- datîne<sup>25</sup>. Lê BARTHOLOMAE di derbarê vê yekê da ti tištî nabêze u tenê balê dikişîne ser vegotina HÜBSCHMANN<sup>26</sup>.

? BENVENISTE dixwaze di nav peyva ûmêt da teśaya \*ummêt ya drêz kirî bibîne, lê NYBERG li berevažî wî dixwaze teśaya ûmêt žî ya kevin \*abi-mati- vebikişîne u bi nîvisa 'ymyt- [\*ûmêt-] ya ku di Dêñ-kart da xuya dibe, ruberîhev bike u bi teśeyeke kevin \*abi-mati- va girê bide. Ligorî dêhna NYBERG qesî ku xuya dibe, guherîna dengê -ē < ēv- < abi- taybetmendyeke zaraveyêñ başur-rozavayî buyee.<sup>27</sup>

Žiber vê hindê Nyberg teśaya ûmêt u êmêt bi vî hawî rekonstrukte dike:

► ûraniya bakur-rozavayî ûmêt ← \*aumêt ← \*aßmêt ← \*abi-mati-.

► ûraniya başur rozavayî êmêt (nîvisî 'dmêt) ← ayim(m)êt ← \*ayißmati- ← \*aßimati- (rbb. Êmêt sn., Êmêtan, bi espîresiyona sekunder Hêmêt; erebî 'Ihmâd; her husan ah(im)mêt → ahmêt [smyt + fars-n. ãmid].<sup>28</sup>

Žiber ku NYBERG peyva kuKurm-n. hêvî di nav ćavan ra derbaz nekiriye u venegotiye, di vê pêşniyaza wî ya ku ûraniya kevin \*abi-mati- di ûraniya bakur-rozavayî da ûmêt dayî bibe, bi guman e.

► ûmêtih «hêvîtî».<sup>29</sup>

► naumêd<sup>30</sup>, numêd «bê hêvî».

• pehl. *umêt, ûmêt* «hêvî»,

► anûmêt «bê hêvî».

• pehl.Pz. *ûmêt*<sup>31</sup>, *aômêt* «hêvî».<sup>32</sup>

• exf-n. *umêt* bdg. (< fars-n.)<sup>33</sup>, *umîd*<sup>34</sup> «hêvî».

• tirk. *umut, üümüt* «hêvî» < fars-n. *umêt*.

\*

Bi kerema xwa žibo «kurtenivîs, ćavkanî u sembolan» li «Bêzenasiya Zmanê Kurdî Ya Giştî -40-» binêrin!

<sup>17</sup> MALMISANIJ 1992: 364a.

<sup>18</sup> GEIGER/KUHN 1895-1901: 267.

<sup>19</sup> HORN 1893: 26, № 109.

<sup>20</sup> JUSTI 1880: 100.

<sup>21</sup> HORN 1893: 26, № 109; HÜBSCHMANN 1895: 17, № 109.

<sup>22</sup> GEIGER/KUHN 1895-1901: 54.

<sup>23</sup> GEIGER/KUHN 1895-1901: 154, 267.

<sup>24</sup> BARTHOLOMAE 1906: 187.

<sup>25</sup> HÜBSCHMANN 1895: 17p., № 109.

<sup>26</sup> BARTHOLOMAE 1906: 187.

<sup>27</sup> NYBERG 1931: 165.

<sup>28</sup> NYBERG 1974: 144b.

<sup>29</sup> NYBERG 1931: 165.

<sup>30</sup> HORN 1893: 26, № 109.

<sup>31</sup> HÜBSCHMANN 1895: 17, № 109.

<sup>32</sup> NYBERG 1931: 165.

<sup>33</sup> HORN 1893: 26, № 109.

<sup>34</sup> HÜBSCHMANN 1895: 17.